

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erdên Sûriye û Lîbnanê, 35 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 5 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê: 25 Qemerî.

# ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc: Weqîf Tabet, Telefona Dîwana: 74 04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû

## SOVYETISTANÊ

### Dest bi Cengê Japonan kiriyê

Nûçeya dawîn a mezintir ev e ko Sovyetistanê, bi qesda qedandina şerê cihanê, û danîna silh û aştîya dinyayê, li ser vexwendîna hevalbendên xwe ên mezin, Emerîka û Inglistanê, dest bi şerê japonan kiriyê. Xwedî piştî Ordiya Sor xurt bike û her çar dewletên mezin; Çîn ji tede ye, roj berî rojekê, bigihîne serfiraziyê û dinyayê ji belayên şerî bifilîtîne. Radyoya Moskoyayê, ev nûçe roja çarşembê; der 8-ê tebaxê sala 1945-an belav kiriyê. Komiserê mîletên Sovyetistanê M. Molotov, sefirê japona li moskoyayê M. Sato aniye nik xwe, û qerara şerî, jê re da zanîn.

Ji aliyê din, di Weşingtonê de, Serekcimbûrê Emerîkayê M. Truman, di civnaya rojnamevanan de, ji mîletê xwe re, û ji cihanê re ev nûçeya giranqîmet belav kiriyê. Nûçeya jorin mîna bombeyek teqîya ye û gihaye çar gûşeyên dinyayê. M. Koneîl, rîsîplî û maqulektî emerîkanî ê mezin gotiye: Pesin ji xwe. dê re, niho şer dîgehe dawîya xwe.

Xwedî arîkariya gernas û egîdan bike yên ko ji bona azadî, serbestî, rahettî, kamiranî û biserxwebûna hemî nijad û mîletên Cihanê, şerê zorkeriyê dîkin.

## Gerandina Dewletekê

Karê welatekî, bi destê wezareta wî û bi karker û bi dîwanan tete gerandin. Axayê wezarê re, serekwezîr tete gotin. Di wezaretekê de, zehf wezîr hene; mîna wezîrê dervekarîyê, wezîrê hindurkarîyê, wezîrê maldariyê, wezîrê şerî, wezîrê paşrojmendîyê; wezîrê kar û xebatê, wezîrê karên civakî, yê keve û mehkeman, wezîrê çand û bazirganiyê, wezîrê zanî û xwendegahan, wezîrê rê û avakirî-nê. Wezarêtin giranetir ev in; lê li gora hewcedariyê wezarêtinê din jî dikarin bêne danîn.

Niho emê, yek bi yek, li xebat û biserxwegirtiyên wan wezarêtan binêrin. Wezîrê dervekarîyê, serê wezareta dervekarîyê ye. Wezareta dervekarîyê, bi siyaseta dewletê mijûl dibe. Sefîr û qînsolosan, şandî û nimnendeyan rêdike ba dewletên din, û bi sefir û qînsolos û nimnendeyên ko welatên biyanî dişînin nik wê, daxêve, bi wan re dixebite û bi çiqas jî destê wê te, dike dost û hevalên welatê xwe bêtir bike.

Bi destê nimnendeyên dewletên ko li ba wî ne; û bi destê şandiyên xwe, yên ko çûne nik wan dewletan, li ser dan û standî-nê, li ser çûn û hatîna peyan, li ser pirsên maldariyê, parastîna ewleyî û biserxwebûna xwe, û ya şnorên erdê xwe lihevhatînan çêdike, û pê rahettî, ewleyî, dewlemendî, qedr û meqama mîletê xwe datne ser bîngêhên qaim.

Wezîrê hindurkarîyê, serê wezareta hindurkarîyê ye. Wezîra wî a mezintir, di hindurê welêt de, rahettî û selametiya xelkê ye.

Bi destê Wall an mihafîz, qaimeqam, nahiye midîrî, karên hindurê welêt digêrinê û ji bona bi cih anîna emrên hikûmetê destê wî de pollî û cendîrme hene.

Ev kar ker û mêmûra hemî, divê bi cih anîna qanûnên dewletê mijûl bibin, li gora qanûn û qeydeyên danî bimeşin; û rahettî û selametiya xelkê ji xwe re bikin Armanc. Heke wîlo ne kirin bersîrîyar dibin û tene şandin.

Wezîrê maldariyê, serê wezareta xwe ye. Ji bona gerandina karên hikûmetê, ji bona bi xwedî kirina esker û pollî û cendîrman, yên ko selamettî û rahetiya şnor û hindurê welêt diparêzin, ji bona vekirina Xwendegah û zanîngehan, ji bona danîna mehkeman, ji bona avakirina qesr û şanîyanê dewletê, ji bona çêkirina xestexana, pir û rê û rêgehan; pere divêtin. Mîlet ji bona rahetiya xwe û ya welatê xwe, her wekî hewcedarî tîstên jorin e, ji malê xwe her sal parek dide hikûmetê; wezareta maldariyê bi berhevkirin û awayê berhevkirin û bi serf û derve-dana vê pereyê, li gora qanûn û isûlên danî mijûl dibe.

Wezîrê şerî, serê wezareta şerî ye. Herwekî serê peyan ji teşkelan vala na bin, serê mîletan jî, tim û daim ne di rahetiye de ne. Çîranên xurt li yên qels, her car, bi çavê qenciye na nêrin. Çavê xwe berdidin mal û erdê xelkê.

Carna bi axaftin, bi mijûlî, û bi arîkariya dost û hevalan, bi siyaseteke dervekarîyê a hejra, mîlet li hev bîn, bi tişteki kêm û zêde, bê pevçûnê, îqê xwe saft dikin.

Lê wextên hene, mîletê ko xwe xurt dihesibîne, dike bi zorê bigehe miradê xwe, bi eskerê xwe dirêjî cîranê xwe dike, ji ber vê yekê her nijad ji bona demeke teng ji xwe re Ordîyek çêdike, û li gora taqeta xwe dike erde xwe ji tada dijmanan biparêze.

Ev karê heja lê giran û dijwar ye wêzîr û wezareta şerî ye.

Heke welat welatekî mezin e, ji bona vî karî sê wezarêtan çêdike, ya qîwetên bejê, û yên av û hewayî. Xwendevanên me

### Strana kurdî :

### Lê Edûlê Rabe!

Lo, na be, qedao na be, bela o na be, ji ber serê min rabe, navê revê navekî xerab e, bêvila min bilind e; zîmanê min dirêj e; di nav dost û dijmanê de, serê bavê min ber jêr na be!

Lo, na be, welatê xerîbiyê çêkek teng e; piyê xwe tê ra me ke; ji me xerîba re nabe bav û kek!

Lo, na be, bela o nabe, welatê xerîbiyê çêkek teng e, debara te dibe, ebûra min na be, Şam şekir e, wetenê mala bavê min şîrin e, destê min ji heval û hogira na be!

Lo, na be, qeda o na be, teniya binê beroşê di rûyê min dao na be, şerîza li ser culhao na be; gevê dihatî, nivê gevê ye; gevê kanûna berfê girtî rûyê erdê ye; bozê rewan avêtê diwarê qesrê ye; Bozê rewan cemidi ye, plkol dikir kendale berfê ye; keçê rabe, ne be sebebê kuştîna lawikê xelkê ye; destê xwe, bi destê mi de, emê berê xwe bidin welatê Kurdistanê, emê xwe bavên qewmê çiyayê, lê na be hikmê dewletê, na de qaçor, û aqar û eskeriya hikûmetê!

Lo, na be, qedao na be, navê revê, navkî xerab e; navê bavê min mezin e, qesra bavê min bilind e, di nav dost û dijmanan de nizim na be!...

Lê, rabe, Edûla min rabe,

tu ga'rê girê de, bera navkêla zirav li ba be, bera dinya li serê min û te qurîçax be, toz û icaca keriyê sor li me rabe, ez na kim terka bejna zirav, heya celata min ne re, bajarê Rohayê, kindîra min ne re welatê Kurdistanê, li Diyar-Bekrê, dara çînarê, derê qela' qapîsê, heya kindîra min li ba be!

Lo, na be, qedao na be, xewa min tê; ji ber serê min rabe; bavê min lok e, barê wî giran e, heçî nav û dengê bavê min bihiştiye, pîberê min na be.

Lê, Edûlê ra be, ga'rê girê de bera navkêla zirav li ba be, destê xwe destê min xîne, lingê xwe li rikêba Delexoro xîne, emê di Feratê Bêlacokê re, di Qerekê Hesen Paşa re, emê bi dewletên ecnebî re, terkî dinya bin, emê bi Romî Paşa re bi neyar bin, emê bi mezinê Moskofa re bi heval bin!..

Lo, na be, qedao na be, belao na be, hega helebê na be, navkê revê navkî xerab e, bêvila min bilind e, zîmanê min dirêj e, di nav dost û dijmanan de berjêr na be, welatê xerîbiyê çêkek teng e, piyê xwe tê ra me ke, ji me xerîba re na be, bav û kek!

Lo, na be, kuro na be, xewa min tê, ji ber serê min rabe, welatê xerîbiyê çêkek teng e, debara te dibe, ebûra min na be, Şam şekir e, welatê jê şîrin tir e, destê min, ji heval û hogirên mala bavê min na be!..

## Bombeyêke Nû

Zanayên emerîkanî û brîtanî bombeyêke nû çêkirîye, ya ko gava di nav bajarekî mezin de dîteqe, xesarîne nedîtî digihîne avahiyên tede. Heta niha mombeyên ên mezintir jî, derbine hinde dijwar pêk ne dianîn. Dema ko bombeke wîlo dîteqe, di pênc sed kîlo mêtîr dîrahîyê de hejana erdê tete hesandin.

Bombeyek wîlo li şarîstaneke japorî hatiye berdan; dû û dû-man ev bajar wînda kirin, qeveke tarî, bi ser wî ve hat, û pê qeş parên bajêr xira bûn.

### EVDILKERIM ÇI DIBÊJE !

Di van rojan de, Evdilkerim, yê ko mehelmi ye, di sûka xedra de, sendûqan çêdike, û di xwendegaha Bêrûtê a şevê de, hîni xwendin û nivîsandîna zmanê xwe ê şîrin kurdî bûye, hatiye xatîrxwaziya Roja Nû û jî me re gotiye:

Roja çarşembê, ez çû bûm Nehrê, û min lê pîrikeke ermen a heftî saft dît, y a ko destê wê de, elfabeke ermenî hebû, û ji xwe re xwendinê dielîme û dinivîse. Ez lê ecêbmayî mame, û kurdên ko hej xwendin û nivîsandîna nîzanîna hatîne pêş çavê min û min ji xwe re gotiye: Ev jîniike îxtîyar e, û bi xwendin û nivîsandîna mijûl dibe; ma ne heyf e, ko mirovîna hene, xort in, tu kêmaniya wan tu ne, û na xebitîna ko zîmanê xwe bikarin bixwînin.

Gava min ev tişt dida eqîlê xwe, dilê min tîşîya û mi digo eve sebebê perîşaniya me.

niho dibînin ko hemî wezîrên dewletekê tevkarîya hev û du dikin. Da ko welat ne keve tengiyekê, wezareta dervekarîyê bala xwe divê bide, siyaseta xwe, ya çîranan û dawî ya cihanê. Wezîrê maldariyê divê, xezîneya dewletê tejl bike, ji bona demên ko zor an zêr dîzane.

Wezareta hindurkarîyê, divê bala xwe bide rahettî u selametiya hindurê welêt. Erdên ko tede rahettî û selamettî nîne, xezîneya mîletê ko vala ye, siyaseta mîletê a dervekarîyê heke bê eqîl û fesal e, heke rûniştîmanên welatekî ji hikûmeta xwe ne razî ne, û ji zîlm û zorkerîya dewletê aciz in, kar û gerandîna mêmûr û dîwanên hikûmetekê de, heger heq û edalet, namûs û bext ne maye, ew dewlet dikeve perîşanî û zîvariye û dewletên biyanî zûka dirêjî dewletên wîlo dikin.

KEVNEZAN

# Usifê Tenbûrwan

Hebû hakimek û sê lawê xwe. Hakim rojek ji roja di xwe fikirî û go: ez pîr bûme, û ev lawê di xwe, min ne ceribandine; bikêrtên ew na yîn.

Rojekê ban lawê xwe ê mezin kir, jê re got: lawo, heger ez mirim, piştî ko ez bimirim tu brayê mezin î, tu ê bibî hakim li ser bajêr; tu ê çî edaletê bimeşîni?

Lawê wîna jê re got; go heçî ta'dayiya li mi bike, ezê ta'dayiya lê bikim, heçî qencî bi mi bike, ezê qenciya pê bikim.

Hakim jê re got: here û ban lawê xwe ê navê kir; ev xeber jê re got: ewê jî wek brayê xwe ê mezin lê vegevand.

Hakim ban lawê xwe ê biçûk kir, navê wî ûsif e, ev xeber jê re got, ûsif li bavê xwe vegevand: heçî xerabiyê bi min bike, ezê qencikê pê bikim, heçî qenciya bi min bike, ezê sê qenciya pê bikim; hege ez herim qehwa, ezê xesareta ehlê qehwa hemo bidim.

Bavê wî destê xwe li piştî wîna xist, û jê dixweş bû û jê re got: sibehe ez dixwazim, ez û tu herin seyranmîşê.

Sibehe her yekî hesbek ji xwe re derxist ji tewlê, hakim û lawê xwe ûsif, meşyan bi çolê de.

Ji sibehe heyantê êvarê meşyan, ûsif ji bavê xwe re got: tu dixwazî me bibe kî derê?

Bavê wîna jê re got: ev va gihane qonaxa xwe.

Nêzîkî qesrekê bûn; gihane ber qesrê, hakim giha ber diwârê qesrê û ji qesrê re got: derî vekel!

Derîk ji qesrê vebû, çûn hinduroyê hewşê; ûsif nêrî ko hewşa qesrê bi ziv resif kiriye, sola xwe ji lingê xwe kir, bavê wî lê nêrî ko sola xwe ji lingê xwe dike, jê re got: çima tu sola xwe ji lingê xwe dikî, go: ya bo, eyb e, ji me re ko em bi qonderê pê li ziv bikim.

Bavê wî jê dixweş bû, kêfa wî gelekî hat, çûn hinduroyê qesrê, nêrî ko du textê de danî; her yekî ji wan li ser textekî rûniştin. Nêrî ko şîva wan hate ber wan, kesî di qesrê de na bînin, ûsif ma ecêbmayî.

Wê şevê razan, sibehe hakim ji ûsif re got: tu çî bixwazî jî dinyayê, ev qesir wê ji te re hazir bike; de rabe emê fcar herine mal.

Nêrî ko hespê wan şidandî hazir bûn. Li hespê xwe siwar bûn, hakim ji qesrê re got: ya bimbarek, nefsma me ez bêdî, derî ji mi re vemeke, heya ko ne ev lawê min ûsif bê, derî ji tu kesî re veneke!

Hatine mal, çend rojekê man, hakim nexweş ket, ji miqlisa xwe re got: heger ez mirim lawê min, yek ji malê mehrûm e.

Çend rojan ma, hakim mir. Piştî ko mir, lawê di wîna bihevdu ne kirin, her yek ji wan ji hev re dibêje, tu mehrûm î,

kes ji wan nizane, ko kî meh rûm e.

Yekî ixtiyar di meclisa wan de heye, ji wan re got: ev îş kesik nikare, saff bike, xeynî Zerî fa keçka şexê ereba.

Her sê rabûn û çûn mala şexê ereba; konaxa sê roja meşyan.

Gihan mala şex, li bin konê wî rûniştin, adeta ereba heye, heyantê sê roja, ji mihvanê xwe na pirsin. Piştî sê roja, ji wan re got: hon bi çî îşî hatine? Hewala xwe jê re gotin, şex ban qîza xwe kir, û mesele jê re got: Keçikê go: ev îşê min.

Keçikê ban brayê mezin kir, jê re got: ez qîz bûm, di mala bavê xwe de bûm, lawê apê min heye, ez dixwestim, bavê min ez ne didamê ye, dilê min zehf li cem wîna bû, û ê wîna jî li cem min bû.

Rojekê yekî tacir hat, bin kohnê bavê min û ez xwestim ji bavê min, xurcikek zêra ji bavê min re vala kir û di wê şevê de, ez siwar kirim û ez birim gundê xwe; mehra min bîrî û ez xistim Odakê, êvarê hat Odê cem min, nêrî ko ez digirîm, ji min re got: çima tu digirî; tu ji min çêtir î, heger tu poşman bûyî, ezê te bibim mala bavê te.

Mi jê re got: ez ne poşman im, feqet dilê min, bi halê lawê apê min digewite; ko xebera wî çêbibe ko te ez xwestime û birime, wê xwe bikuje.

Gava ko ev xeber bihîstê tacir, ji min re got: tu li min heram bî, û li lawê apê xwe helal bî.

Ev pereyên ko mi da bavê te, qelenê lawê apê te, hesabekî mi tu ji wî re aûf; here cem lawê apê xwe; ko bi min re hat heyantê nêzîkî gundê vegeyriya çû; ez hatim mala lawê apê xwe.

Gava lawê apê min ez dîtîm kêfa wî pir hat, û ji min re got hewala te çî ye, min jê re hewala xwe got; ewîna jî go: madam ê tacir wîlo şîr helal e, tu jî li min heram bî, here vegere cem ê tacir.

Ez çûn cem ê tacir; heke tu ê tacir bûna, te xurcika zêra bi min bidana, te ê ji nû ve ez vegevandama, ji lawê apê min re?

Kurê hakim jê re got: erê, ma insanetî ne maye?

Go: tu here, ban brayê wîna ê navê kir û jê re got: heke tu lawê apê min bûna û ez wîlo bihatama cem te, te ê cardî ez bibirama ji ê tacir re?

Go: erê, qencî qenciya nas dikel Keçikê jî wî re jî got tu here; ban ê biçûk kir ûsif; û ev xeber hemî jê re got; go: heke tu ê wek tacir an wek lawê apê min bûna, ez a wîlo xweşik bi destê te kevîm, te ê ez berdamal

Ûsif jê re got: na, çawan dilê min li te hebe û ez te berdîm, ezê xwe bidime kuştin, û ez nahêlim tu ji cem min herî.

Keçikê go: baş e; ban her du brayê wîna kir û ji wan re got: brayê we ê biçûk, mehrûm e ji malê.

Her sê lawê hêkim vegeyriyan, hatin mala xwe; du sê roja man, brayê xwe bi der kirin ji mal. Qesir bi bîra ûsif ne hatiye, ji xwe re di nav bajêr parsê dike, gelekî perîşan bû, çî mala ko diçiyê, jê re dibêjin here, heger tu baş bûna, brayên te tu bi der ne dikirin.

Rojekê li ber diwerekê rûniştiye, û bi halê xwe de digirî, qesra wîna hat bîra wî, rabû ser xwe û ji bajêr bi der ket, heyantê êvarê gihaşt qesrê, qesrê re got: ya bimbarek derî vekel!

Derî jê re vebû, çû hinduro, nêrî ko va hemam, germ e, av û sabûn hazir e, xwe şuşt. Nêrî ko bedlek cilê milûkî hazir bû jê re; cilê xwe li xwe kir, hat nêrî ko textek hazir e, li ser textê xwe rûnişt, şîva wîna hate ber wî, şîva xwe xwar, û serê xwe danî û raza.

Sê roja di wê kêfê de ma, piştî sê roja, ji xwe re go: ezê rabim, herim, ber bi brayê xwe de.

Nêrî ko hespek jê re hazir bû, ziha û gemê wîna, hemî zêr in. Bi ser piştî hespê ket û berê xwe da bajêr.

Her du brayê wîna jî, poşman bûne û digirî û dibêjn, çawan me brayê xwe bi der kir; bîst xulam li mala me hene, ew jî weke wana bûna, û eyb e ji me re, ko brayê me parsê dike; li brayê dipirsin, saxlîxî wîna hilnansînin; ew dibê, qey hina kuştîye; dorbî-nê wana li ber çavê wîna ne, li ser rîya dinêrin.

Carekî nêrî ko siwerek ji wê ve tê, gewqî wî siwarî diçe, ewana go: qey helkî siltan hatiye bajarê wan, her du lawê hêkim pêrî wî siwarî ve çûn, serê hespê wîna girtin, û anîn, banî xistin jîr, hespa wî kuştandin tewlê, her du lawê hêkim lê dinêrin û digirî.

Ûsif ji wan re got: çima hon digirî? jê re gotin: brakî me hebû, bavê me ew ji malê mehrûm kiri bû, û me ew bi der kir, û em poşman bûne, û em lê digerin, em wîna na bînin; tu di gîklê wîna' de ye; me li te nêrî, brayê me hat bîra me û em giriyan.

Ûsif ji wan re got: heger hon brayê xwe bibînin, hon nasnakî go: gotin: belê, heger tu niha ne di wî şîklê de bûna, menê bigota tu î.

Ji wan re got: ez brayê me me! Kêfa wan pir hat, û jê re gotin: ya brayê me, ev mal jî te re, jî kû? Ûsif ji wan re got: ez di nav bajêr de bûm, min ji xwe re parsê dikir, yekî cuhî, ji min re got: were cem min bişuxile, ez pê re çûm, mi nêrî ko malê wî zehf e, û mi ê cuhî kuşt û ez di mala wî de rûniştim.

Her du brayê wî jê re gotin: lazim, emê sibehe herin, li mala te bifericin.

Sibehe her sê rabûn, li hespê di xwe siwar bûn û berê xwe dan qesrê û meşyan; heyantê êvarê meşyan gihane ber qesrê, nêrî ko derî di qesrê de vebû ji keviran.

Gava her du brayê wîna dîn, ko hewşa qesrê timam ziv e, nêrî ko sê text ji wan re hazir bûne, şîva her siya, her yekê bitenê, hat ber wana.

Her du brayên wîna mane ecêbmayî; û ji hev re gotin: lazim, sibehe em wîna bi xwe re bibine çolê û em bikujin û em vê qesrê, ji xwe re bihêlin; ev qesir jî bajarê me hemî çêtir e.

Sibehe ji brayê xwe ê biçûk re gotin: em dixwazim herin nêçîrê. Brayê wîna got: bila be, her sê siwar bûn e hespên di xwe û meşyane, heyantê êvarê, rastî şkeftê hatin. Her du brayê di mezin gotin: emê îşev di vê şkeftê de razin, ûsif ji wan re got: hon bi ya min dikin, em di şkeftê de ranazin.

Her duya go: belê, emê razin, û di dilê wan de, ko brayê xwe ûsif bikujin, di şkeftê de.

Her diwa a xwe kiriyê yek û bihortin hindurê şkeftê, û ûsif bi wan re.

Carekê nêrî ko derê şkeftê li wan hate girtin, nêrî ko hûtek di devê derî de ye.

Ûsif gûrê xwe kuşt û çûye, bi gûrê xwe li wî hûtkî dixîne, çîqa lê dixîne, tiştêkî pê na be.

Hûtkî ji wan re got: ez canpola me, ji niha heta sed salî, hon li min xînin, tu ta'dayî bi min na be; şertêkî min heye, heke hon bikin, honê xelas bin, heger hon ne kin, honê bîmînin di şkeftê de, heyantê ko hon bimirin. Brayê mezin, go: şertê xwe ji me re bêje. Hûtkî go: şertê min, ezê lingê xwe ji hev bikim, honê di nav lingê min re derbaz bibin, herin ji der ve.

Brayê mezin go: ez hatim, hûtkî lingê xwe ji hev kir, û brayê mezin di nav lingê wî re derbaz bû, hûtkî çîrek mîz, bi piştî wî de berda, heft destê goşt, ji laşê wî hilandin. Heft parsê, di laşê wî de şkenandin, heft rihê mîrniyê ji piştî wî qetandin, mala wî xira kir.

Di fikra brayê navê de, ko brayê wî ê mezin xelas bû, ewî jî go: ez hatim. Hûtkî çîrek mîz bi wî jî berda, ew jî ket halê brayê xwe, her du jî, ji der ve lihevdu rast hatin, hevdu nas na kin, tiştê ko bi berê wan hatiye.

ne qediya ye

## Metbelokên kurdî

Hek ker bi nefs e, mistek ceh bes e.

Asasê ser berfê.

Xalxal ji midara, spî ji qerpala.

Mêranî hebe, di kevir da ye.

Ji xwe re tenûrek sax bihêlin.

Kêvroşk ji çîya na tirs e.



# Stranwarî

## Der Warê Stran â Dilanan

### ZEMBILFIROŞ

Hati bû ser xênî carek  
Mi dî bû rûyê bimbarek  
Mi gotî bû kêf û halek  
Ya xanim ez hêsr im.

Zembilfiroş la'wîkê dewrêş e  
Kerem ke were pêşê  
Heqê zembilê bibêj e  
Ez ji bizna te bûm kher û gēj e.

Gul Xatûn, ez tobedar im  
Hurmetê, ez bi erz û eyal im  
Zaro birçî ne, li mal in,  
Ez ji rebê jorî ni karim.

Xatûna gerdên bi morî  
Şixul na be, bi kotek û zorî  
Singa mi, berfa zozana  
Memikê min, mîna fîncana  
Were bibe xeyra te tê  
Îsaleh, tu herî cunetê.

Lê, lê, lê lê, Xatûnê  
Bejna te ji dara zeytûnê  
Tirsa min ji agirê Eytûnê  
Gul xatûn, ez tobedar im  
Hurmetê, ez bi erz û eyal im  
Dereng e, li min êvar e,  
Zaro birçî ne, li mal in  
Tirsa min ji Xalikê cebar e.

Zembilfiroş zembila tîne  
Li sûk û bajara digêrine  
Xanim li birçê dibîne  
Eqil dere, sewda dimîne  
Goşt dere, hestî dimîne  
Rûh dere, qalik dimîne.

Zembilfiroş lawîkê feqîr e  
Tu were ser doşeka mir e  
Binêre li zulf û herîr e  
Li min heram be, li mir helal be.

Gul Xatun ez tobedar im  
Hurmetê, ez bi erz û eyal im  
Zaro birçî ne li mal in  
Dereng e, li min êvar e  
Ez ji rebê banî nikarim  
Zembilfiroş, lawîkê ebas e  
Bi tena derpê û kiras e  
Ji Xatunê na be, xelas e

Zembilfiroş, lawîkê rewan e  
Gerîya dikan bi dikan e  
Xanim ban kir dergevan e  
— Wî bîne hewşê  
Derî bigirin  
Miftê bînin ban e.

— Hatûnê, lê, lê hurmetê  
Agirê Xwedê bi serî ketê  
Tu ji min dixwazî meselehetê  
— Tu were bike xeyra te tê  
Xwedê kerim e  
Heya roja qiyametê !

Gul xatûn, ez tobedar im  
Hurmetê, bi erz û eyal im  
Zaro birçî ne, li mal in  
Dereng e, li min êvar e  
Ez ji rebê jorî ni karim.

Xatûna, li ser wî banî  
Dengî ba kir dergevanî  
— Miftê bîne, wer banî  
Kes bi halî kesî ni zanî.

Gul xatûn ez tobedar im  
Hurmetê bi erz û eyal im  
Zaro birçî ne, li mal in  
Dereng e, li min êvar e  
Ez ji rebê banî ni karim.

### Te d'binim

Te d'binim te na binim lê gewrê  
Dest li gerdênê wer tînim cana  
min

Aşiqê çavê şin im, esmera min  
Qîza ji xorta distînim delala min  
Tîrsim bimrim ne binim cana min

Dakefî ser kaniyê  
Şar berda ser panîyê  
Mî ramîsanek jê xwestî  
Ev heqê cîraniyê delala min.

Riya Eyin-Tirbê bi qaş e  
Paqê Zeko qimaş e  
Hek hon Zeko nas na kin  
Ereq vexwar serxwaş e  
Tu dî bû, li ber dîwêr e  
Ez ji bejnê ne bûm têr e  
Mî ramîsanek jê xwestî  
Tirsa min ji kûçikê mêr e.

### ŞEX NEROZ

Şex Nerozo tu zanî  
Ker vayî, kurtan kanî  
Şex Nerozo, dongizo  
Kurtanê kerê gêx dizol  
Ey Naroz, Naroz, Naroz  
Kerê reş, kurtanê boz.  
Ar tûtîk, bervar tûtîk  
Şex Zîlanê, dûv rûtîk.

### Qumrî

Qumrîkê ez gune me  
Şivanê bavê te me  
Aşiqê bejna te me  
Ebdalê çavê te me  
Ez goriya serê te me.  
De yar, yar yar, de yar yar yar  
Bête xewka min na ye.

Qumrîkê ser bi zêr e  
Sing dergehê bajêr e  
Qumrîkê na dim mêre  
De yar, yar yar, de yar yar yar  
Bête xewka min na ye.

Qumrîkê bi zêr helandî  
Keçîk lawîk revandî  
Serê li havê gerandî  
De yar, yar yar, de yar yar yar  
Bê te sebra min nayê.

Qumrîkê ez gune me  
Delalê ez gune me  
Esmerê, ez gune me  
Ez şivanê bavê te me  
Aşiqê bejna te me  
Ebdalê çavê te me  
Ez goriya serê te me.

### Kejê

Tu kej î, tu kej î  
Dilê min kefî te jî  
Çogê min şkestin  
Nîkarim herim, mala xwe jî.

Bejna Keçikê  
Tayê tirincê  
Dîranê mehrûmê  
Heba birincê

Destê, çavreşê  
Dermanê qolincê.

Welêh bileh tu kej î  
Dilê min kefî te jî  
Çogê min şkestin  
Nîkarim herim, mala xwe jî.

### MEMIR

Memir, Memir, Memir  
Mamîto lo..  
Mamo ji xursê tê  
Mamîto lo..  
Bihna guta jê tê  
Mamîto lo..

Memir, Memir, Memir,  
Lo, mamo lo,  
Xelkê dosta te bir  
Lo mamo lo..  
Xwelî li serê te kir  
Mamîto lo  
Xwelî li qehfê te kir  
Rebeno lo..

# MIRÊKA CIHANÊ



Sereya Sansûsî, di Potsdamê de ye, Kralê elemana ê mezintir Frîdrîk ev qesir ji xwe re ava kiri bû. Di Pêvoka Potsdamê de serekên Hevalbendan çûne dîtina wê awahiye. Serekwezîrê britani ê berî M. Çorçil di hindurê qesrê de ye, û li qesrê û li esrex û li wêneyan dinêre.



Jin û dotên axa Ewropa vegirtî, yên ko di destê elemanan de, keti bûn belengazî û şerpezeyigê tene derman kirin, pora wan qirêj e û lêde spî ji hene. Dîktor û nesaxnêrên swêçî bala xwe didin wan. Xelkê Ewropayê, ji jin û dotên ko nesaxa derman dikin û li wan dinêrin, xwişk dibêjin



Serekwezîrê Britanya Mezin ê nû M. Atli, piştî xelaseka pêvo voka Potsdamê, ji Berlînê veqerîya ye û hatiye payetextê britani. Serekwezîr di nav kolanên Londrê de bi rê ve diçe.



Serekwezîrê britani ê berî, M. Çorçil, di nav kavil û xirbeyên payetextê elemani de. Zelfî taxeyên Berlînê bi derbên bombeyên Hevalbendan tar û mar bûne. Serekwezîr nemaze bala xwe daye zesarên dijwar, yên ko giha bûn qesra serekwezareliya elemani, ko lêde qerara wî şerî a xedar ji aliyê Hitler ve hatî bû dayîn û bi perîşani û zivariya nijadê elemani qediya ye.

# ME BIHISTIYE

— Generalê amerîkanî, Corc Keney, serfermendare qiwetên Hevalbandan ên hewayî li Rohelatê Dûr gotiye: wextekî nîzing de, hero 5000 bombeavêj û kelehên firok ên amerîkanî bi ser axa japonan a mader de, bigirin û ji hêla jêrîn ve, 5000 ton bombeyên şewat û teqandinê havêjin, hêjagehên eskerî û yê destxetan, mîna karxaneyên çek û posatên şerî, febrîqeyên top û tang û balafiran, destgehwapor û gemiyên şerî, bender û qerargehên stola japonî û kar û barên di wan.

— Mehkema Mareşal Peten di Parisê de çêdibe; tometa Mareşalê eve ko wî dixwest awayê cîmhûriyetê rake û ji aliyê din destdaye dijminên welatê Frensê û arîkariya wan kiriye.

Peten gotiye hakîma: ev mehkeme ne xwedî selahiyet e ko li doza min binêre û ez li pîrsên we venagerînim; û mîna gotina xwe kiriye û di pêşya mehkemê de, devê xwe venake.

— Mîrov ne hewceye ko zehf sinhet û destxetan bielim; bes e ko destxet an siheteke wî hebe lê divê di karê xwe de çehreza be. Dibêjin ko ingilzêk hebû, xwedî neh sinhet, lê nikarî bû jîna xwe bixwedî bike; ingilzêkî din hebû xwedî sinhetek; lê karê xwe xweq dîzanî û dikarî bû neh jîna bixwedî bike.

— Gotina ko ji devê te derneketiye, xulamê te ye; û tu dibî xula me gotina ko ji devê te derketiye. Beriya ko tişteki bibêjin zehf bala xwe bidinê; ko we got qediya; divê soza xwe n'êxin erdê.

— Zaroyên xwe me tîrsînin, ko we ew tîrsand, dibin derewker. û yê ko derewker e, tîrsonek e; û yê ko tîrsonek e, zehmet e ko bikêrî tişteki be.

— Heke we neheqî kir, zû izra xwe bixwazin; heke heq destê we de ye, tu caran dev jê bernedîn û têde pê bidin erdê; yê ko neheqî kiriye divê bişûnda here; heke we wîlo ne kir, û rîya neheqan ne birî; qedrê we nayê girtin û dawî hon perîşan û şerpeze dibin.

— Isal, di Erjentînê de, 2.500.000 ton genim çê bûye.

— Karxaneyên frensîzî isal 2.000 balafîr çêkirine. Balafîra frensîzî a mexin « Latécoer-631 » dest bi firinê kiriye. Di wê de 40 rêwîngî bi cih dibin; ev 72 ton giran e, 6 motorên di wê hene, hemî bi hev re 7.840 hesp xurt; 36 ton bar hildigire, di saetkê de, 350 kilomêtr difire.

— Şeş mehên wê salê ên pêşîn de, karxaneyên sovyetî, yê şekirî, karê xwe, çak pêk anin e. Di erdên azad kirî de, zehf karxaneyên nû hatine çêkirin. Di axa Ukranyayê de, berî şerî 160 febrîqeyên şekirî hebûn, û van febrîqan, di salê de, 140.000 ton şekir çêdikirin.

— Elemana 29 hebên van xira kirine û mekîneyên 30 hebên din jî, bi xwe re kirine. Di sala 1944-an de 72 karxaneyên şekirî dest bi xebatê kirine.

— Di Sotreyê de, par 1372 febrîqe cil û kiras, derpi û gore çêdikirin. Ji van febrîqan 44 heb, dev ji xebatê berdane, lê 79 febrîqeyên nû hatine danîn û van dest bi xebatê kirine. 311 febrîqe ji pembû 121 febrîqe ji hevrûşimê û 95 febrîqe ji giyan cil û derpi û kiras çêdikin. Jê pê ve 180 karxane jî kiriyê qîmaq û citan çêdikin.

## LES CAHIERS DE L'EST

Le premier volume d'une collection d'études, de textes, de pages littéraires de notes et documents intitulée « Les Cahiers de l'Est », vient de paraître. Fondée par Maître Camille Aboussouan, cette série de publications devra représenter l'aspect intellectuel du Liban et des pays voisins aux yeux de l'étranger, et constitue un trait d'union entre les colonies libanaises et la Mère Patrie.

Très richement documenté, parfaitement informé, ce premier cahier, est ce qu'il y a eu de plus sérieux comme organe de grande information intellectuelle jusqu'à présent au Liban.

## "TRAVA" S.A.

La Compagnie Nationale du Liban et de Syrie

### TRANSPORTS INTERNATIONAUX

DE MARCHANDISES DE L'ANGLETERRE, U.S.A., SUISSE, FRANCE, INDES, EGYPTE, IRAN, IRAK, VERS LE LIBAN ET LA SYRIE.

### VOYAGES-TOURISME

BILLETTS DE CHEMINS DE FER, AVIONS, BATEAUX POUR AMÉRIQUE DU NORD ET SUD.


### ASSURANCES

CENTRALE : 55, AV. DES FRANÇAIS, BEYROUTH  
TEL : 86-19 — 85-61

SUCCURSALES : { DAMAS, RUE SALHIÉ, TEL. 16-37  
ALEP, RUE GOULAB, TEL. 0-34

## PÊJINÊN DINYAYÊ

Xebat - Fidakari - Serfirazî - Serdesdî



Kenser nesaxiyeke gelek dijwar e, pê her sal, bi hezaran mîrov dimirin. Zanayên frensîzî gelek bala xwe dane wê nesaxiya xedar. Sala dawîn, çend zanayên frensîzî di Parisê de, bi awakî nûjen, dest bi dermankirina kenserê kirine. Xebata zor, ya ko di wê dawiyê de hatiye kirin, berine hêja daye û saxkirina wê nexweşiyê de, gavine pehin hatine pêş ve avêtin. Wêneyên jorîn, xebata zanayan pêş me dikin. Kenser di zehf derên bedenê de çêdibin, li ser zimên, li rûviyan, li ûrê, li qirtekê û lîthin eihên din.

### Yar Sînemê!

Taq rêhana li mergeo  
Tu b'tenê me çê avê o  
Dest avêtê gerdênê  
Xweşîn ketî naveyo  
Dikim Sînem ramîsim  
Gune di stoyê baveyo  
Yar Sînemê, Sînemê

Hewara rebê alemê  
Yar Sînemê, Sînemê  
Setara rebê alemê.  
Taq rêhana li mergeo  
Tenî me çê helala  
Dest avêtê gerdênê  
Xweşîn ketî xilxala  
Dikim Sînem ramîsim  
Gune di stoyê hevala.